Meşa Sor

Hesen Şucaî

Êvara westyayî ji xebatê
meş bi meş dimeşim
gava li ser milê rastê dinêrim
meşik sor bi rengê asinê agir pêdayî bimeşe...
wekî qulingê koçer
westiyayên koça bilind
bi qêrîneka hêvîgir
dildarî dinan bo
kendaveka serbest
pêlên sor li hev diketin û
li dirêjaya gelyê Kotolê da
reş diman ji dîtinê
te digot,
soratiya cîgirtî
di pişt çiyayên birek birek
di nav bêdengiya ser bi mor
deng didan pêlê jiyanê, ‘’bimeşe!’’....